**Birêz Dêûbav**

Em dixwazin bi dilekî xweş malbata We û berî her tiştî jî hatina zaroka We ya kreşê bi rêya vê nameyê silav bikin. Cihê li kreşan ferzendeke mezin dide zaroka We ku xwe li Elmanya asûde bibîne. Ew kare li vê derê hinek asayîtiyê bijî, azmayîşên erenî bidêhev, bi zarokên din re bilîzê û pir tiştên din fêrbibê. Li cem gelek tiştên din zimanê Elmanî jî fêr bibe. Zarokên di wî temenî de bi zarokên di hemantemenî de bi lez fêrdibin.

**Mafzagona ji bona cihên di kreşê de û bêadidatî**

Li Elmanya mafzagona her zarokê yek salî heye, cihêkî lênêrinê bixwaze. Wekî bû disalî, ev lênêrin di kreşên li Rheinland-Pfalz de ji bona dêûbavan mift e. Di bexçeyên berîdibistanan de cihên lîçdemî û cihên tevdemî hene. Bi cihekî lîçdemî de zarok karin danê sibihê werin kreşan û piştî navbera firavînê, danê evarî dîse wegerin kreşê. Bi cihekî timdemî de zarok karin sibihê heta evarî li kreşê bimênin û nivro jî xwarinek germ bixwin.

**Peywirên kreşan û yên hînbûnê**

Kreşan peywir sitandine ku bihêvotin, fêrbikin û lêbinêrin. Xwe ji bona asaniya zarokan peywirdar kirine. Armanc ev e, ku ji zarokan kesayetiyên bi berpirsiyariya xwe û behremendiya civakê bihêvotin û pêwendî û tatola wan ya cîhanê werê piştgirtkirin. Ji xeynî wan jî, wek mînek, nêveng wusa hatine avakirin ku zarok karibin bi serê xwe leyzokan bikar bênin û wan biceribênin. Hêvojer dinerin gelo çi bi teybetî bala zarok dikşênê û li gora balkişandina wî pêşniyarekî dikin. Heman demî derfet ji bona zaroka We heye bi zarokên din re bilîze, ji wan û bi wan re fêrbibe.

Ji bona zaroka We xwe asûde bibîne, pewist e ku tekiliyên bawerî bi hêvojeran re werin avakirin. Ji bona vê yeke zaroka We wê hedî hedî bêsewh bibe. Dêûbav di roj û heftiyên serî de bi zarokên xwe re diçin kreşê. Demên ku zarok bê dêûbav di kreşê de biburênê, wê hedî hedî werê zêdekirin heta ku zarok karibe bi serê xwe tenê di kreşê de bimêne. Ev bi gelemperî çar heftiyan berdewam dike. Hûnê vê bi ferehî bi hêvojeran re biaxivin.

**Hevaltiya perwerde û hêvojê**

Hûn wek dêûbav ji bona kreşê bervêderekî pir girîng in, anko Hûn zaroka xwe ji herkesî çetir nasdikin. Hûn zanîn, wek mînek, hij çi xwarinê dike, çilo disekinê û çi bi keyf dilîzê. Kreş dixwazin bi We re wek dêûbav tevde kar bikin. Gelek cureyîn cuda yên hevkariyê hene: Dembihêrkên di demê ku Hûn wî bênin an bibin, axaftinên dêûbavan yên di jivanên hatine biryardayîn, evarcivîn û kahveyên dêûbavan û hwd. de.

Bingehiya hevkarî di rêbazê de bi gelemperî bi peymaneke hêvojê de, yeke ku Hûn bi berpirsiyarê[1] kreşê re li hev bikin, tê verast kirin. Li ser vê mijarê Hûnê ji aliyê kreşê ve bi berferehî werin agahdar kirin.

Ji kerema xwe re li ser karê hêvojkarî de pirsan li kreş bikin û ji wan re bêjin, çi di hêvoja zaroka We de ji bona We girîng e. Xwestinên We yên di mijarê hêvojên de, dive werin gufttûgokirin. Di serî de bi kreşê re biceribenin derfetên wergerê bi yên din re bikar bênin ku Hûn xwe bi hêvojkaran re bidin

[1] Di rêbazê de berpirsiyarên kreşan bi gelemperî komava, dera evangelikan an katolîkan e an jî yên insiyatifên dêûbavan an.

têgihiştin. Derfetên hevkariyê bikar bênin. Evê ji We re bibe alîkarî ku Hûn di kreşê de têkiliyan deynin.

**Perwerdeya Olî**

Di kreşê de zarok û mezinên bi cudatiyên orîjîn, netewe, çand û olî ve bi alînegireke gişt rastî hev tên. Perwerdeya olî mijara her kreşê ye. Di Rheinland-Pfalz de li cem berpirsiyarên komavan û dêûbavan, kreşan bi berpirsiyarên mezhebî, yên wek evangelîkan an katolîkan, hene. Di wan deran de rojanî di bin bandora kiristiyanî de ye. Hûn û zaroka We bi bawerî û olê xwe ve bi serxêriyekê dilxwazî werin wan saziyan. Ya herî baş xwe di serî de li cem amrazbûna zaroka xwe de agahdar bikin, çilo perwerde û hêvoja baweriyê di kreşê de werê verast û jiyankirin

**Zimanê jêderkî, perwerdeya zimên û handeriya Zimên**

Bi alikariya zimên mirhov kare bi derdora xwe re têkiliyê ava bike û têgihişte wê bibe. Yani fêrbûna zimanê Elmanî jî ji bona zaroka We pir giring e. Li gora mezinan zarok zimanekî biyanî di pêşî de pirbilez fêrdibin. Ev, wê li cem zaroka We jî bi tekiliyên zarokên hemantemenî yên di Kreş de, baş werê cih. Ji bona vê yekê pir girîng e ku zaroka We karibe bi zimanê xwe yê jêderkê bi rumet be. Ji kerema xwe re li malê wek her demî bi zaroka xwe re bi zimanê malbatê biaxivin. Tenê wekî zarok zimanê xwe baş biaxive û ev jî ji derdora wî ve werê naskirin, hingî ev kare bi asûde û tatol bikeve piş zimanekî din û xwe ji bona fêrbûnên behtir amade nîşan bike. Hêvojkar vê zanin û di wê di vê mijarê de alîkarî bidin zaroka We.

Di gelek kreşên ku hijmareke mezin yên zarokên bi pişkêşana göçberiyê têde heyîn, di vê pêvajoyê de hinek pêşgiriyên handerên zimên û pisporên ji bona karê navçandeyê piştevaniyê didin. Hinek ji wan bi xwe xweyî pişkêşana goçberiyê ne û têra xwe azmayîşen wan hene, gelo tê çi wateyê, wekî mirhovek li diyarekê biyanî ser lingên xwe bisekine.

**Kreş wek derên piştgirtiyên keddêr û peşniyariyê**

Li Elmanya hijmarek pir yên piştgirtiyên keddêrê ji bona malbatên nû hene. Kreş gelemperî bi toreke baş di taxên bajaran de bi hevre giredayîne û pêşniyariyên ku Hûn ji bona malbata xwe bi kar bênin, nas dikin. Lê dêûbavên din jî zanin li kîjan tara bajêr, çi pêşniyariyên din hene, yên wek cihên agahdariyê, kursên zimên ji bona We wek dêûbavan, pêşniyariyên komelan. Ji kerema xwe re derfetên heyî yên ji bona fêrbûna Elmanî bikar benin ku Hûn xwe li Elmanya baştir beralîbikin. Hijmarek mezin ya komelan heye, wek yên werzişê ku Hûn û malbata We karibin ji wan têkiliyan bigrin. Di serde jî alîkariya di pirsên hêvojê de an jî pêwendiyên bi azmayîşên bêhedar de, yên wek warteriqandîn û tarewgeh de karin werin dîtin. Rê nedin ku bizaviya We werê şikandin. Bi hêvoj û dêûbavên din re têkiliyan pirs bikin û lê bigerin. Berdikevê!

Em ji We re ji bona jiyana li Elmanya xêriya bêdawî dixwazin!